

Yê Mezin Kî Ye?

18 ¹ Wê gavê şagirt hatin ba Îsa û jê pirsîn: «Di Padîşahiya Ezmanan de yê herî mezin kî ye?» ² Wî gazî zarokekî kir, di nav wan de da rawestandin ³ û got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim, heta ku hûn venegirin û nebin wek zarokan, hûn tu caran nakevin Padîşahiya Ezmanan. ⁴ Loma, kî xwe wek vî zarokî nizim bike, di Padîşahiya Ezmanan de yê herî mezin ew e. ⁵ Û kî ku zarokekî weha bi navê min qebûl bike, ew min qebûl dike. ⁶ Lê kî ku yekî ji van biçûkên ku bawerî bi min anîne ji rê derxe, ji bo wî çêtir e ku beraşekî mezin bi stûyê wî ve bê daleqandin û bikeve binê deryayê.

Jirêderketin

⁷ «Ji ber tiştên ku mirov ji rê derxin, wey li serê dinyayê! Nabe ku ev sedem neyên, lê belê wey li wî mirovê ku ew sedem bi destê wî bîn. ⁸ Eger destê te an lingê te, te bixe guneh, wî jêke û ji xwe bavêje. Ji bo te çêtir e ku tu bê dest an bê ling bikevî jiyane, ne ku tu bi herdu dest û bi herdu lingên xwe ve bêyî avêtin nav agirê herheyî. ⁹ Û eger çavê te, te bixe guneh, wî derxe û ji xwe bavêje. Ji bo te çêtir e ku tu bi çavekî bikevî jiyane, ne ku bi herdu çavan ve tu bêyî avêtin nav agirê dojhê*.

Mesela Miya Windabûyî

¹⁰⁻¹¹ «Binêrin! Hûn yekî ji van biçûkan kêr nebînin. Çimkî ez ji we re dibêjim ku milyaketên wan li ezmanan her gav li rûyê Bavê min ê li ezmanan dinêrin.

¹² «Gelo hûn çawa dibînin? Eger sed miyên mirovekî hebin û yek ji wan riya xwe winda bike, ma ew not û nehan li çiyê nahêle û naçe li ya windabûyî nagere? ¹³ Û eger wê bibîne, bi rastî ez ji we re dibêjim, ewê ji wan not û nehên ku riya xwe winda nekirine bêtir bi wê şa bibe. ¹⁴ Bi vî awayî Bavê we yê li ezmanan jî naxwaze ku yek ji van biçûkan winda bibe.

Birayê ku Gunehan Dike

¹⁵ «Eger birayê te li hember te guneh bike, here û gava ku hûn herdu bi tenê ne, sûcê wî nîşanî wî bide. Eger ew guhdariya te bike, te birayê xwe kar kir. ¹⁶ Lê eger ew guhdariya te neke, kesek an du kesên din jî bi xwe re bibe, <da ku her peyv bi devê dido an sê şahidan rast derkeve.> ¹⁷ Lê eger ew nexwaze guhdariya wan jî bike, ji civîna* bawermendan re bêje. Îcar, eger ew nexwaze guhdariya civîna bawermendan jî bike, bila êdî ew ji bo te bibe wek yekî pûtperest û bacgir.

¹⁸ «Bi rastî ez ji we re dibêjim, hûn çî li ser rûyê erdê girêdin, ewê li ezmên jî bê girêdan. Û hûn çî li ser rûyê erdê vekin, ewê li ezmên jî bê vekirin. ¹⁹ Careke din bi rastî ez ji we re dibêjim, eger dido ji we li ser rûyê erdê, li ser her tiştê ku bixwazin, bibin yek, ewê ji aliyê Bavê min ê li ezmanan ve ji wan re çêbe. ²⁰ Çimkî li ku derê dido an sisê bi navê min bîn ba hev, li wir ez jî di nav wan de me.»

Mesela Xulamê Bêrehm

²¹ Hingê Petrûs hat ba Îsa û jê re got: «Ya Xudan, gava ku birayê min li hember min guneh bike, divê ez çend caran li wî bibihûrim? Ma heta heft caran?» ²² Îsa bersîva wî da: «Ez ji te re dibêjim, ne heta heft caran, lê heta heftê caran heft. ²³ Çimkî Padîşahiya Ezmanan dimîne vê yekê: Padîşahek hebû ku xwest bi xulamên xwe re li hesab binêre. ²⁴ Gava ku padîşah dest bi hesab kir, yekî ku bi deh hezar telant* deyndarê wî bû, anîn ba wî. ²⁵ Ji ber ku nikaribû deynê xwe bide, axayê wî emir kir ku ew, jina wî, zarokên wî û hemû malê wî bîn firotin û deynê wî bê dayîn. ²⁶ Xulam xwe avêt ber lingên wî, jê lava kir û got: <Li min sebir bike, ezê hemû deynê xwe bidim.> ²⁷ Dilê axa bi wî şewitî, ew berda û li deynê wî jî bihûrt.

²⁸ «Lê gava ku xulam derket derve, wî hevlekî xwe yê xulam dît ku bi sed zîvî* deyndarê wî bû. Wî destê xwe avêt qirika wî û got: <Deynê min ê ku li te ye bide.> ²⁹ Hevalê wî yê xulam xwe avêt ber lingên wî û jê lava kir û got: <Li min sebir bike, ezê deynê xwe bidim.> ³⁰ Lê wî nexwest, çû û ew avêt zîndanê heta ku ew deynê xwe bide.

³¹ «Gava ku hevalên wî yên xulam ev yek dîtin, gelek xemgirtî bûn, rabûn çûn ba axayê xwe û hemû tiştên bûyî jê re gotin. ³² Hingê axa xulam gazî ba xwe kir û jê re got: <Hey xulamê xerab! Ji ber ku te ji min lava kir, ez li hemû deynê te bihûrîm. ³³ Wek ku ez li te hatim rehmê, ma ne diviya ku tu jî li hevalê xwe yê xulam bihatayî rehmê?> ³⁴ Axayê wî hêrs bû û ew da destê cefakeran, heta ku ew hemû deynê xwe bide.

³⁵ «Eger her yek ji we ji dil li birayê xwe nebihûre, Bavê min ê li ezmên jî wê bi vî awayî li we bike.»

